

Dosya Taybetî

Tehdîta Jenosîdê û Êzîdî -2-

Êzîdî delîla herî mezin ya hebûna me ne. Gelek nîrxên me yê netewî: Zimanê me, dîroka me, adet û toreyên bav û kalên me, bi orîjînalîteya xwe gihandine roja me. Di qonaxên dîrokî de, gelek qûrban dane. Ev salek e, êrîşên hovane li ser wan zêdetir dibe. Bi şêweyekî hovane, nîrxên me, nîşana hebûna me, gav bi gav ber bi tunebûnê ve dibin...

Em, niqaşa pîrsê ji awira ewlekariyê û mafê mirovan ve pir giring dibînin. Di vê dosya taybetî de, em ê dîtînen şexsiyet û dezgehên netewî/ navnetewî li ser pîrsê pêşkêşî we bikin. Cotmeh 2008, Stockholm.

EuroKurd Human Rights

Dr. Ismail Beşikçi: Parastina Êzîdiyan wezîfeya Hikumeta Herêmê ye

Gabar Çiyan

Dr. Ismail Beşikçi eyne ye. Neynik e. Rastiya me, bi xweşî û nexweşî, rastî anjî şaşîtiyan nîşanî me dide. Dr. Beşikçi pîsporê Doza Kurdan e. Pirtûkên wî, nivîsên wî li ser Kurdan in. Wî ji ber helwest û dîtînen xwe, beşek ji jiyana xwe di zindanê de derbas kir...

Pîrsa Parastina Êzîdiyan li dijî xeterên terorî, pêşxistina tore û adetên bav û kalên me, anku yê Êzîdiyan, pîrsek giring e. Me dîtina Dr. Ismail Beşikçi li ser pîrsê girt.

- Birêz Dr. Beşikçi, weke ku hun jî zanin, di van demên dawiyê li dijî Êzîdiyan hejmarek êrîş pêk hatin. Armanca êrîşan, gav bi gav tunekirina Êzîdiyan, jîholêrakirina çandê ye. Hilweşandina baweriyek kevnare ye ku rehên xwe kur berdane erdê welatî. Hedefa wan: Tunekirina nîşan, delîl û koka me kurdan e.

Ji bo parastina Êzîdiyan, pêşxistina çand û baweriyên kevnare, wezîfeyên me çi ne, divê çi bê kirin?

Dr. Ismail Beşikçi: Êzîdî Kurd in. Baweriyên Kurdan ya berî peydebûna ola Îslamê hemêz dikin, diparêzin. Êzîdî, berî jidayikbûna Mesîh bi sedan salan li jora Mezopotamyayê bicîh bûbûn û li ser xaka xwe jiyana xwe didomandin.

Êzîdî di gelek qonaxên dîrokî de, ji ber êrîşên Kurdên olîslamî, mîrên Kurdan û ereban mexdur bûne, neheqî li wan hatiye kirin. Lê Êzîdiyan, herdem, ji bo Rizgariya Netewa Kurdistanê, ka rû xebat kirine, di şer de cîh girtine, û şehîd dane.

Pir giring e ku Gelê Kurd li ser bingeha vê zaniyarê nêzî Êzidiyan bibin, wan nas bikin. Pêwîst e Gelê Kurd bi awayekî sistematîk, bi zanabûnên piralî û kur li ser welatperwerî û fedekariya Êzidiyan û giringiya parastina çand û ola kevnare bêne ronîkirin...

Divê em dema peydebûn, û pêşketina Îslamê bînine bîra xwe: Dema ku xelkê bi şurê zorê dikirin misilman...

Di demek wisa de, **parastina nîrxên Netewa Kurd dihate çi wateyê?** Li hemberî zordarî û tadayiya baweriyên biyanî, **eks û israra parastina nîrxên Netewa Kurd dihate çi wateyê?**

Divê em li ser rastiya van pirsan kur bibin, bi zaniyariyê nêzî pirsê, anku Êzidiyan bibin...

Pêwîst e cihên Êzidiyan tevli sînorên Herêma Kurdistanê bibe. Laleş di nav sînorê Herêmê de ye. Êzidiyên Şexanê, ji awira parastinê ve, „ji aliyê êrîşên ji derve û komplo û planên li dijî wan“, di xeterê de ne.

Ji bo ku Êzidî karîbin baweriyên xwe bi azadî bidin domandin, pêwîstiya wan bi aramiyê heye. Divê ewlekariya cihê wan xurtir bibe, li wir rewşek azad pêk were.

Divê Rêvebirên Hikumeta Herêmê vê yekê bibînin...

Pêwîst e ji bo pêşxistin û xurtkirina aborî û civaka Êzidiyan polîtîkayek pêk were. Divê ev polîtîka, weke wezîfeyek giring ya Hikumeta Herêma Kurdistanê bê dîtin.

Êrîşên neteweperestên ereban li dijî Êzidiyan herku diçe zêdetir dibin. Ew dixwazin Kurdan weke suçdar nîşan bidin û şûpheyên li dijî Kurdan zêde bikin. Di van mehên dawî de, hejmarek êrîş li dijî Mesîhî û Asuriyan pêk hatin. Divê armanca êrîşan di çarçoveya hatiye qalkirin, bêne nîrxandin.

Divê Kurd li hemberî lîstik û komployan pir şiyar bin...

Pir giring e, û pêwîst e Hikumeta Herêma Kurdistanê û Gelê Kurd bi peyv, beyan, û çalakiyên xwe ispat û nîşan bidin ku ew, bi Êzidiyan re ne, piştgiriya wan dikin. Her wisa ew piştgiriya xwe ji bo Mesîhiyan jî bi erênî nîşan didin.

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net